

## KÜRTÇE-TÜRKÇE-İNGİLİZCE TEKNİK TERİMLER SÖZLÜĞÜ FERHENG A ZARAVÊN TEKNİKÎ KURDÎ-TIRKÎ-İNGİLİZÎ

KURDÎ	TIRKÎ	İNGİLİZÎ	PÊNASE
Adaptor::Guncêner	Bağdaştırıcı	Adaptor	Parçeyek ji pêveka makîneyekî ku du parçeyên cûda bi hev girêdide. Amûrê ku sînyala elektrîkê li gora cîhazê diguherîne.
Adiyabatîk	Isı almaz	Adiabatic	Kereseyê ku tînê nagire.
Adiyon :: Lyona serrû	Yüzey iyonu	Adion	Elektrona durtîrîn ji navenda atomê.
Agahiyên bin :: Agahiyên jêr	Alt bilgi	Footer	Di rûpela nivîsê de agahiyên ku li jêra rûpelin û di derbarê naveroka rûpel de agahî didin.
Agahiyên jor	Üst bilgi	Header	Di rûpela nivîsê de agahiyên ku li jora rûpelin û di derbarê naveroka rûpel de agahî didin.
Aktîvasyon::Çalak kirin	Etkinleştirme	Activation	Destpêkirina kirariyê.
Aliyê saetê ve :: Hêla saetê ve	Saat yönünde	Clockwise	Zivîrîna wek ku saet dizivire.
Alkola etîlî	Etil alkol	Ethyl alcohol	Bi fermantasyona karbonhidratên ku di fêkî, regên riwekan û di hinek zadan de heye çêdibe. Di araqê de tê bikaranîn, bê reng e û agirgir e.
Amalgam	Cıvalı alaşım	Amalgam	Amêjeya ku zîbeq(cıva) tê de heye.
Amplîdîn	Amplidin	Amplidyne	Amûra ku elektrîka guherbar digre û diguherîne elektrîka rast.
Analog	Analog	Analog	Daneyên ku bi domdarî di guherînê de ne.
Antên	Anten	Antenna	Amûra ku pêlên elektromagnetîk digre an jî dide.
Antîfrîz::Dijqerisîn	Antifriz	Antifreeze	Madeyek şilek û zivistanê tevî radyatora makîneyan dibe da ku ava hundirê radyatorê cemed negire. Piştî ku antîfrîz dikeve nava ava radyatorê xala cemedinê ya ava radyatorê jî sifir(0)ê kêmtir dibe.
Antîmade	Antimadde	Antimatter	Cêwiya made ya dijber.
Armatür	Armatür	Armature	Amûra ku lambe tê de bi cî dibin da ku bi hêsani ronahiyê belav bikin.
Asenkron::Nehevdem	Eşzamansız	Asynchronous	Ne hemdemî. Makîneyên ku di heman demê de bersiva daxwazên cûda dikare bide.
Avêtin	Atış	Toss	Bi alîkariya hêzekî ku heyber tê pekandin.
Ayrometer	Havaölçer	Aerometer	Amûra ku tîrbûniya gazê dipîve.
Bandora compton	Compton etkisi	Compton effect	Rewşa zêdebûna qama pêlên foton ku li elektronek dikeve ye. Dema foton li elektronek dikeve qama pêlên fotonê zêde dibe.
Bandora doppler	Doppler etkisi	Doppler effect	Büyera, frekansa pêlekî li gora çavdêrek bi tevger ( an nêz dibe an jî dûr dikeve) di dem û cihê cuda de bi awayekî cuda tê fêmkirin e.
Bandora joulê :: karîgeriya joulê	Joule etkisi	Joule effect	Kanûna ku tîkiliya navbera herk(tezû) a ku di tîlekî de derbas dibe û ew tîna ku jê çêdibe.
Banivîs	Yel yazar	Anemograph	Amûra ku rewşa bayê bi daneyên grafîkî davêje ser kaxiz.
Bapîv	Yel ölçer	Anemometer	Amûra ku ba pê tê pîvan.

Bar(yekeya pestoyê)	Bar(basınç birimi)	Bar (unit of pressure)	Pestoya ku dema 0,1 N hêz li 1 mm <sup>2</sup> qadê tê bikaranîn dertê.
Barê Elektrîkî::Barê karebayî	Elektrik yükü	Charge	Zêdebûn an jî kêmbûna elektronan a li cihêkî.
Barê elementerî	Elementer yük	Elementary charge	Barê elektronekî. Yekeya barê elektrîkî.
Barê mezin	Kaba yük	Gross charge	Barê elektrostatîk yê mezin.
Bargegir ::Kondensator	Kondansatör :: Kapasitör	Capacitor	Amûra elektronîkî ku barê elektrîkî li ser xwe kom dike.
Bargegirî	Sîğa	Capacitance	Rêjeya şiyana(Tiwana) bargegir(kondensator)ek.
Bargeker	Yükleyici :: Doldurucu	Charger	Amûra ku enerjîya elektrîkê li batarya, komker an jî bargegiran bar dike.
Barpîv	Yükölçer	Coulometer	Amûra ku barê elektrîka statîk dipîve.
Berçavik	Koruma gözlüğü	Goggles	Berçavka ku ji bo çav biparêze tê bikaranîn.
Bêrehend	Boyutsuz	Impartial	Rewşa ku dirêjahî, bilindahî an jî firehî nîn e. Mînak: xal
Berguhk	Kulaklık	Earphone	Amûra ku dikeve hundirê guh û deng jê tê.
Bername	Program	Programme	Pakêta kodan a nivîsbariyê ku ji bo peywirekî hatiye amadekirin. Femandeyên ji bo kompîterê. Erkdariyên pêdiviya kompîterê.
Betal	İptal	Cancel	Rawestandî. Sekinandîna kar.
Betal	Boşta	Idle	Yê/a ku naxebite.
Bêtel	Telsiz	Wireless	Şandîna sîgnalan bi alîkariya pêlên elektromagnetîk. Di vî karî de têt (raguhêzbar) nayê bikaranîn.
Betona bi baryûm	Baryumlu beton	Barytes concrete	Betona ku Baryûm tê de heye. Bi giranî xîz û xîçe wî ji baryûmê pêk tê.
Biçûkkirin	Küçültme	Minimize	Ji aliyê mêjerê ve kêmkirin.
Bihevvedanîn	Birleştirmek	Merge	Pêvekirina herî kêm du heyberên cuda.
Bihîstîni	İşitirlik	Audibility	Çawaniya dengê ku tê bihîstin.
Bikartûş	Fonksiyon tuşları	Function keys	Tûşên kilavyeyê yê ku hinek fonksiyonên nû pê çêdibin.
Bilindgo	Hoparlör	Loudspeaker	Amûra elektronîkî ku deng jê dertê. Amûra ku dengê televizyon an jî radyoyê jê tê.
Bilindpîv::Altimetir	Yükseklik ölçer	Altimeter	Amûra ku bilindahiyê li gora asta pestoyê dipîve.
Bilindker :: Amplifikator	Yükselteç	Amplifier	Amûra elektronîkî ku sînyala deng, ronahî an jî elektrîkê bilindtir dike.
Bimeşîne :: Bixebitîne	Çalıştır	Run	Fermana destpêkirina kar.
Bindawêr	Alt simge	Subscript	Sembola li jêr.
Binxêz bike	Altını çiz	Underline	Fermana ku di kompîterê de ji bo binê nivîsê were xêzkirin tê bikaranîn.
Bipejîrîne	Kabul etmek	Accept	Fermana ku di nivîsbariyê de wateya wê qebûlîna e.
Biqedeme :: pîledar	Aşamalı	Gradual	Rewşa dem, cî an jî rewşa ku bi awayê gav bi gav diguhere.
Bîrdanka parvekirî	Paylaşılmış hafıza	Shared memory	Bîrdanka ku kompîterên din jî dikarin xwe bigihînin.
Birek	Kesici	Cutter	Amûra ku ji bo birînê tê bikaranîn.
Biriqîn::Teyisîn	Parlamak	Shine	Ronîdan. Biriqandîna ronahiya ku ji jêderêkê tê .
Bişkok	Buton	Button	Bişkoka ku ji bo xebitandinê tê bikaranîn.

Bişkok	Düğme	Key	Amûra ku ji bo tezûya elektrîkê vedike û digire. Bi gelemperî ji bo vekirin û girtinê tê bikaranîn.
Bişkoka elektrîkê	Elektrik düğmesi	Electric switch	Bişkoka ku tezû(herk)ya elektrîkê vedike û digire.
Bixebitîne	Çalıştır	Execute	Fermana ji bo destpêkirina karê sazîkirinê.
Bizivirîne	Çevir	Rotate	Vegerandina li dora navendê.
Bûyera navendrevî	Merkezkaç olayı	Centrifuge	Bi bandora zivirînê hêzek ku berê wê li dijî navendê ye çêdibe ye.
Cama ximamî	Buzlu cam	Depolished glass	Cama ku zelaliya wê jê hatiye birin.
Caxika dirîşt	Kaba Izgara	Coarse grid	Caxika ku ji şivên hesinî hatiye çêkirin û ji bo ku parçeyên gir yê nav aravê veqetîne tê bikaranîn.
Cercere	Çıkrık	Spinning wheel	Maşîna ji bo hilkişandinê ku werîs(anjî ben) li dora xwe dilefîne.
Conta	Conta	Gasket	Kereseyê ku ji bo madeyên şilek neçirizin tê bikaranîn. Di piston anjî boriyan de tê bikaranîn.
Cot tikandin	Çift tıklamak	Double-clicking	Bi parçeyê kompîterê yê bi navê mişk tikandina du carî.
Cotmetal	Çiftmetal	Bimetal	Parçeyên metal ên ku ji hev cuda ne û ji bo çêkirina termostatê li ser piştê hev tene rûniştandin.
Çala reş	Kara delik	Black hole	Heyberekê ku hêza kêşana wê gelek mezin e, ku ji hemû made û heta tirêjên ronahiyê nikarin jê dûr bikevin.
Çapkirin	Yazdır	Print	Fermana ji bo ku belge di çaperê de li ser kaxez derxîne.
Çawanî	Nitel	Qualitative	Rewşa xuya ku nayê hesabandin.
Çelqandar	Çalkalayıcı	Agitator	Amûra ku ji bo tevdanê tê bikaranîn.
Çerx	Çark	Cogwheel	Ew parçeyê makinêyê ku ji aliyê tewereyekê ve tê zivirandin.
Çewtî	Hata	Error	Di kompîterê de lihevqirasebûn û ne lihevhatina kodan.
Çewtiya xeterdar	Kiritik hata	Critical error	Di kompîterê de lihevqirasebûn û ne lihevhatina kodan a bi awayekî xeterdar.
Çîmento	Çimento	Cement	Ew amraza hîdrolîk a hev girtinêye ku tevliheviya kevîrên kalkê û gil, di germahiyê-ke zêde de tene germkirin û hêrandin
Çîrk	Saniye	Second	Yekeya demê ya ku ji 60î yekê xulekê.
Dahatûnasî	Gelecek bilimi	Futurist	Zanista ku derbarê dahatuya civakê de xebat dimeşîne.
Dahûrîna komkirinê	Kümeleme çözüm- lemesi	Cluster analysis	Rêbazê taybet a çareserîkirinê.
Dahûrîner	Çözümleyici	Analyzer	Amûra ku sîgnalan kontrol dike û taybetiya sîgnalan nîşandide.
Dane	Veri	Data	Agahî û agahiyê di derbarê tiştekî de.
Danegeh	Veri tabanı	Database	Hard dîska ku dane tê de tene bi cî kirin. Daneyên ku ji bo pergalekê û anjî naveroka malperê hatiye afirandin. Di kompîterê de qada ku lê agahî û dane tene bi cî kirin ji bo bikaranînê.
Dardaroka elektrîkê	Elektrik sarkacı	Electric pendulum	Küreyekî ku bi madeyekî ne gihêner daleqandiye û li gora barê elektrîkê yê dora xwe pêş de an jî paş de diçe.
Dardaroka hêsan	Basit sarkaç	Simple pendulum	Benekî hilawistî girêdayî û bi seriyê serbest ve heyberekî bi giraniya G heyê û bi awayekî serbest tevdigere.
Darika amrazan	Araç çubuğu	Toolbar	Di kompîterê de parçeyek ji bernameyê mîna geroka înternetê anjî autocadê ye ku alîkariya bikarhêner dike.
Darika pêşdeçûnê	İlerleme çubuğu	Progress bar	Di kompîturê de nîşandêra barbûyîna agahiyan e.

Darika rewşê	Durum çubuğu	Statusbar	Di kompîterê de li jêra rûpel e û agahî di derbarê rûpel de dide.
Dawerkêr	Damitıcı	Alembic	Amana laboratuwar ku madeyên şilek tê de tê dawerandin.
Dekagram	Dekagram	Decagram	Yekeya giraniyê ya ku 10 car li gramê ye.
Dekalître	Dekalitre	Decaliter	Yekeya qebareyê ya ku 10 car li litreyê ye.
Dekametre	Dekametre	Decameter	Yekeya dirêjahiyê ya ku 10 car li metreyê ye.
Dekar	Dekar	Decare	Deh caran Ar(100 m kare)ê ye û 1000 metre kare. Ar jî wekhevê 100 metre kare ye.
Dêlîn	Kamaşma	Glare	Bi bandora şewqa zêde nedîtina çavan.
Delînbar :: Derbasbar	Geçirgen	Permeable	Rûyê ku madeyê şilek û gaz dibihurîne.
Dema betal	Boş zaman	Idle time	Di kompîterê de dema ku bername naxebite.
Dema gerê	Devir süresi	Cycle time	Di sînyalekî de dema ku yek dewr digire. Dema 1 frekasê. $T=1/f$
Dema gihîştinê	Varış süresi	Arrival time	Di çûyîna ji cihek heta cihek din de dema ku derbas dibe.
Dema ragihîştinê	Erişim süresi	Access time	Di kompîterê de dema ku ji bo yek yekê dane were xwendin.
Dendika atomê::Nukleûs	Atom çekirdeği	Nucleus	Navenda atomê ku ji proton û neutronan(ji bilî Hidrojenê) pêk tê.
Dengzanî	Sesbilim	Acoustics	Beşa zanistêye ya lêkolina dengên diyarkirî dibe.
Derbas bibe	Geç	Skip	Di kompîterê de ji bo derbasbûyîna gava piştê.
Derbasbûn	Geçme	Pass	Karê derbasbûyîne.
Deriyê Û	Ve geçidi	And gate	Di mantiqê de bi alîkariya „1“ û „0“ ferman têne çêkirin. Heke du daneyên pêş ne „1“ bin di encamê de „0“ dertê.
Desîbel	Desibel	Decibel	Ji dehan yekê yekeya dijiwariya deng.
Desîgram	Desigram	Decigramme	Yekeya pivaneyê ku ji dehan yekê gramê ye.
Desîlître	Desilitre	Deciliter	Ji dehan yekê litreyê ye.
Desîmetre	Desimetre	Decimeter	Ji dehan yekê metreyê ye. 10 cm.
Destûr bide	İzin ver	Allow	Di kompîterê de ji bo ku bername kar bike ji bikarhêner bi vê peyvê derstûr dixwaze.
Dosyeya veşartî:: Fayila veşartî	Gizli dosya	Hidden file	Di kompîterê de daneya ku hatiye veşartin.
Dûrahiya zenît	Başucu uzaklığı	Zenith distance	Dûrahiya goşeyî ya ji zenît û navbera xalekî li fezayê.
Dûrakî	İraksak	Divergent	Awayê neynik û mercekên ku heyberan durtir nişan didin.
Elektronên cotbûyî	Eşlenmiş elektronlar	Paired electron	Çotek elektron.
Elipsoyd	Elipsoit	Elipsoid	Şêweyê gilover lê dişibe hêkê.
Enerjiya xwenûker	Yenilenebilir enerji	Renewable energy	Cureya enerjîyê ku zewalê nadin jîngehê. Mînak: Roj, Ba, Pêlên deryayê. . .
Faraday	Faraday	Faraday	Yek faraday 96485,3365 coulombs.
Faz	Faz	Phase	1. Raguhêzbarên ku elektrîkê radigihînin. 2. Rewşa pêlekî li gora firekansê.
Fireh	Geniş	Large	Ya ku qada wê zêde ye.
Fiyo :: Sîgorta	Sigorta	Fuze	Amûra ku ji bo parastinê tê bikaranîn. Ji astekî zêdetir tezû(herk)ye derbas nake û dişewite.
Fizîka kuwantûmê	Kuantum fiziği	Physics of quantum	Zanista fizîkê ya herî modern ku bîngeha xwe li ser parçêkirina atomê avakirîye.
Fonon	Fonon	Phonon	Encama lîza hevpar a atomên ku di krîstalekî de ne.

Fonta sabît	Sabit font	Fixed font	Cûreya nivîsê di kompîterê de.
Fosforbûn	Fosfor gibi ııldama	Phosphores- cence	Ronahîdayîna wek fosforê ku di tariyê de şewq dide.
Frekans kanalê	Kanal frekansı	Channel frequency	Frekansa ku weşana kanalek li ser tê kirin.
Galvanîzkirin	Galvanizlemek	Galvanize	Noqandina metalan di ava galvanîzê de ji bo metal nerize.
Galvanopîv	Miniakım ölçer::Galvanometre	Galvanometer	Amûra ku bi prensîba elektromagnetîka bi guherîna tezûyê çêdibe dixebite. Tezûyê dipîve.
Gêjen	Devre	Circuit	Di amûrên elektronîkî de riya ku tezûya elektrîkê tê de derbas dibe.
Gêjena girtî	Kapalı döngü	Closed loop	Di gêjena elektrîkê de cihê ku danheviya hemû tezûyê sifir e.
Germahî	Sıcaklık	Temperature	Enerjiya kinetîk a molekulî ya sîstemekî.
Girêbide	Bağlan	Connect	Fermana ji bo pêvebûnê an jî ji bo tevlihbûnê.
Herka guherbar:: Tezûya Guherbar	Dalgalı	Alternating	Cûreya enerjîya elektrîkê ya ku wek sînyala sînus e. Pêlên elektrîkê bilind dibe piştê kêm dibe û xwe dubare dike.
Hevdemî bike::Senkronîze bike	Senkronize et	Synchronize	Fermana ji bo ku bibe hevdem.
Hewatênebor::Batênebor	Hava geçirmez	Hermetic	Taybetiya keresevî ku tê de ba nabore. Rewşa ji hewayê îzolekirî.
Hêza hespî(h.h.)	Beygir gücü (b.g.)	Horse power	Yekeya xurtaniyê ku piranî di otomobil û motorên elektrîkî de tê bikaranîn. Ev yeke ji aliyê James Watt ve ji bo ku mirov karibin xurtaniya makîneyên xwe fêr bikin hatiye dîtin.
Hilberandin	Üretmek	Generate (to)	Bi alîkariya hinek enerjîyên cûda wek av, roj û bayê bidestxistina elektrîkê.
Hipotenus	Hipotenüs	Hypotenuse	Dirêjtîrîn la(kêlek)yê sêgoşeyê rast.
Hişkalav	Donanım	Hardware	Parçe an jî beşên kompîterê.
Jîriya çêkirî	Yapay zeka	Artificial intelli- gence	Çêkirina fermanên kompîterê ku di bin mantiqa xwe de fikirîna mirovan mînak digirin.
Kawçûk	Kauçuk	Rubber	1. Madeyeke plastîk, neguhêzbar û ji bo parastinê tê bikaranîn. Ji aliyê endustriya kîmyayî ve jî rûn tê çêkirin. 2. Aweke ku ji rehekên daran çêdibe.
Kişan	Genleşme	Expansion	Bi bandora germahiyê zêdebûna qebare an jî dirêjahiyê.
Kolektor	Kollektör	Collector	Ji 3 lingên transîstorê yek. Berhevker.
Kompîtur	Bilgisayar	Computer	Amûra ku ji nermalav û hişkalavê pêk tê û agahiyên ku em didinê di nava xwe de digre. Dema em jê dixwazin wan agahiyên dide.
Krîko	Kriko	Jack	Alawa ku ji bo giranî bilindkirin û li hewa hilgirtinê. Ji bo bilindkirina makîneyan tê bikaranîn.
Kronometre	Kronometre	Chronometer	Amûra ku demê bi saet, xulek, çirk û salîseyê dipîve.
Lamba	Lamba	Lamp	Amûra ku bi elektrîkê dixebite û peywira wê ronayî dayîn e. Enerjiya elektrîkê diguherîne enerjîya ronahiyê.
Lar	Gradyan	Gradient	Xwarahi(larî)ya rastexêzê.
Lêbigere	Ara	Browse	Destpêka xebatê ji bo dîtina agahiyê.
Madeya Raguhêzbar	İletken Madde	Conducting Material	Cureya madeyê ku tê de elektrîk derbas dibe. Elektron a dawî ya atoma van madeyan bi hêsanî jê diqete.

Masule :: Gergere	Makara	Pulley	Amûra ku bi alîkariya werîs ji bo hilkişandina barekî tê bikaranîn, wek lûleyek gilover e û li dora xwe dizivire.
Pêgirî	Bağimlilik	Dependence	Nirxeke ku li gora guherbarekî nirx diguherîne
Pêkhêrandin	Bileştirmek	Compose (to)	Li nav hev xistin.
Performans	Performans	Performance	Rewşa xurtaniya di derbarê karekî de.
Polarîskop	Polariskop	Polariscope	Amûra ku ji bo ronahî polarî bûye an jî xwezayî ye were fêmkirin.
Qanûna biosavart	Biosavart kanunu	Law of Biosavart	Vegotina matematîkî ya qada manyetîkî bi awayê tezûya ku wê çêkiriye nişan dide.
Qerisî	Donmuş	Frozen	Rewşa madeyê ku ji şilekî derbasî req(hişk) bûye.
Qerisîn::Cemidîn	Donma	Freezing	Guherîna rewşa made ya fizîkî ji şilek ber bi req(hişk)î.
Qewar	Oyuk	Hollow	Cihê qewartî, hundurê wê vala û çalik.
Ra::Gravîton	Gravîton	Graviton	Parçeyek atomê ku hê nehatiya dîtîn û hêza kêşanî radigihîne.
Raqim	Yükselti :: Rakım :: İrtifa	Altitude	Bilindahiya ji asta deryayê.
Rûpêş	Arayüz	Interface	Di bernamêyên kompîterê de rûpela sereke ya ji bo bikaranîna fermanên bernamêyê.
Sererastkirin	Düzeltilim	Debug	Di nivîsbarî an jî kompîterê de çareserkirina çewtîyan.
Sterîl	Steril	Sterile	Rewşa paqij ku zindewariyên yek şane nîn in.
Şifre vekirin	Şifre çözme	Encoding	Çareserkirina şifreyê.
Şîyan::Tiwana	Güç	Power	Di yekeya demê de carandina hêza ku tê sepanandin û riya ku tê girtin. Karê ku di yekeya demê de hatiye kirin.
Teka(karîgeriya) hall'ê	Hall etkisi	Hall effect	Gihênereki ku tê de tezû(herk) derbas dibe û di nava qada elektromagnetîk de ye vekêşan çêdibe.
Teka(karîgeriya) zeeman	Zeeman etkisi	Zeeman effect	Rewşa guherîna xêzên tîrêjên ronehiyek ku di nava qada elektromagnetîk de ye.
Veguhêr	Dönüştürgen:: Konvertir	Converter	1. Amûra ku sînyala elektrîkê diguherîne(Ji AC dike DC an jî ji DC dike AC) 2. Bernamêya ku formata agahiyê diguherîne.
Vehelîn ::Buhujîn	Erime	Melting	Guherîna rewşa madeyekî hişk(req) ku bi alîkariya tîn û pestoyê ber bi şilekiyê ve.
Vêxistin::Pêxistin	Tutuşturma	Ignition	Gelemperî ji bo dest pê kirina şewatekê.Destpêkirina agirekî, destpêkirina şuxulandina motorekî.
Xala hevsengiyê	Denge konumu	Equilibrium position	Rewşa heyber anjî sistemêkî ku hêza net a li ser sifir e.
Xubara gerdûnê	Evren tozu	Cosmic dust	Xubara ku di vahaliya fezayê de ye.
Zivirîn	Fırdolanım :: Dönüş	Gyration	Tevgera ku wek vederek li dora xwe didome.

**Hazırlayan: Hasan Güneylî**  
(EMO Diyarbakır Şube)  
Kaynak :www.endezyar.org  
İletişim :info@endezyar.org